

BIXWINE Û XWEDÊ NAS BIKE !

Xudan ji me re çi dibêje?

XUDAN dibêje: "Hûnê li min bigerin û dema ku hûn bî hemû dilê xwe li min bigerin, hûnê min bibinin."

XWEDÊ YEK E

Xwedayê me XUDAN, XUDANÊ ku yek e. Xudayê xwe XUDAN bî hemû dilê xwe, bî hemû canê xwe û bî hemû quweta xwe hez bike.

(Lêvegerandin 6, 4-5)

XUDANÊ ku ezman efirandîye, yê ku iikil daye dinê û ew efirandîye, ew zexm kirîye û yê ku ew bî pûçiti neafirandîye, bona ku li ser were rûniitin, Xwedayê ku iikil daye wê wisa dibêje: "XUDAN ez'im û yeki dîn tune"

(Îşaya 45, 18)

Da hemû miletên dinê bizanin ku XUDAN yê ku XWEDÊ ew e; pê ve yeki dîn tune.

(I. Qral 8, 60)

Ez XUDAN im, navê min ev e. Ez Mezinahiya xwe nadim keseki dîn, spasiya xwe ji nadim pûtên çêkiri.

(Îşaya 42, 8)

XUDAN dibêje: "Hûn şahidên min û xulamên min yên ku min bijarti ne...da ku hûn bizanin û bî min bawer bikin û fehm bikin ku ez Ew im; beri min XWEDÊ tune bû û piiti min ji wê nebe. Ez, Ez XUDAN im; û ji bili min Xelasker tune."

(Îşaya 43, 10-11)

Ey hemû kujiyên dinê, ber bî min ve werin ku hûn rizgar bibin; ji ber ku XWEDÊ Ez im û yeki dîn tune.

(Îşaya 45, 22)

XUDAN DIPARÊZE Û ZEHF DILOVANIYÊ DIKE

XUDAN dil bî rehm û dilovani ye. Gelek bêhnfireh e û kerema wi pir e. Jî ber ku ezman ji erdê çiqas bîlind e, kerema Wi ji bona yên ku ji Wi bihurmet xof dîkin wisa bîlind e.

(Zebûr 103, 8 û 11)

Kerema XUDAN her û her li ser wan e, yên ku ji Wi xof dîkin.

(Zebûr 103, 17)

Ma Xudayê ku mina te guneh ef dike, ki ye?...Jî ber ku Ew ji merhamet kirinê hez dike.

(Miia 7, 18)

Jî kerema XUDAN e, ku em mehf nebûn e. Jî ber ku merhameta Wi xelas nabe.

(Mersiyeyên Yêremya 3, 22)

Jî ber ku Ew derd bide ji, li gora zehf bûna kerema xwe merhamet dike.

Mersiyeyên Yêremya 3, 32)

Tu li mirovê dilovan re, dilovaniyê diki.

(Zebûr 18, 25)

Jî XUDAN re şikir bikin, jî ber ku Ew rind e; jî ber ku kerema wi abadîn e.

(I. Tarix 16, 34)

XWEDÊ JI TE HEZ DIKE

XUDAN ji berê ve ji min re xuya kir û wisa got: "Erê, min bî hezkırina abadin ji te hez kir; ji ber vê yekê min tu bimerhamet kışandi cem xwe."

(Yêremya 31, 3)

Ji ber ku ew fikrên ku ez ji bo we difikırım ez zanim, XUDAN dibêje, fikrên xirabiyê nine, encax fikrên silametê ne. Wisa ku, hatinek ronak û hêvi bidim we.

(Yêremya 29, 11)

XUDAN dibêje: Min hûn hez kırım.

(Meleyaxi 1, 2)

Bav çawa li ber zarokên xwe dikeve, XUDAN ji wisa li ber yên ku jê xof dıkın, dikeve.

(Zebûr 103, 13)

Erê, zêde tengasi kışandin ji bo silametıya min bû. Lê belê bona ku tu canê min hez diki, te ez ji qoncala rizibûnê rizgar kırım. Ji ber ku te hemû sûcên min avêtin piit xwe.

(Îşaya 38, 17)

Hezkırina XWEDÊ ya ku ji bo me heye em zanin û me iman bî Wi anıye...Em hez dıkın, ji ber ku pêşî XWEDÊ ji me hez kır.

(I. Yûhenna 4, 16 û 19)

Xudayê te XUDAN, xelaskerê bihêz, di nav te de ye. Wê ji bo te gelek iabibe; wê di nav hezkırina xwe de Bêpêjin bimıne û wê ji bona te bî melodyên gelek iabibe.

(Sefanya 3, 17)

XWEDÊ NASKIRIN DI JIYANÊ DE QONAXA HERİ BILIND E

Gelê ku Xudayê xwe nas bike, xurt dibe û mêrxasitıyê dıke.

(Daniêl 11,32)

Yê ku methê xwe dide, bila bî vına methê xwe bide: Bî fêhmdar bûnê, û bizane ku ew Xudanê di dınê de merhamet, edalet, û rastıyê dıke, ez im bila; bila bî vına meth bıkın. Ji ber ku ez ji evana hez dikim, XUDAN dibêje.

(Yêremya 9, 24)

Çi dilgeş in; yên ku şehadetıyên Wi digirin û bî hemû dıl li Wi digerin!

(Zebûr 119, 2)

Min jıyan û mırın bereket û lanet daynin ber te; ji ber vê yekê jıyanê hılbijêre. Wisa ku, Xudayê xwe XUDAN hez bıki, guh bidi Kelama Wi û bî Wi ve bêyi girêdan ji bona ku tu û nijada xwe bıjin. Ji ber ku jıyana te, Ew e.

(Lêvegerandin 30, 19-20)

Xezal çawa hesreta avên ku diherikin dıkışın e, canê min ji wisa hesreta te dıkışın e, ya Xudayê min.

(Zebûr 42, 1)

JİYANA BÊXWEDÊ FELAKET E

Heta ku hûn tev XWEDÊ bın, Ew li tev we ye û dema ku hûn li Wi bigerin ewê xwe ji we re bide ditin; lê belê dema ku hûn Wi berdın, Ew ji we berdide.

(II. Tarix 15, 2)

Dil ji her tışti zêdetir xapınok e, û zehf rızı ye; ma ki dıkare wi fehm bike?

(Yêremya 17, 9)

Rê heye ku ji mirov re rast xuya dıke, lê belê dawıya wê, rêya mırınê ye.

(Methelokên Silêman 16, 25)

Eger XWEDÊ, melayeketên ku guneh kîrin nehêvişandibin; lê belê ji bo hukum kîrinê veartibin, û avêtibin qatê cehenemê yê heri bini û di tariyê de zencir kîribin. Xudan dizane mirovên biiman di ceribandînê de çawa rîzgar bike. Û yên ku neheqî kîrine, bona ku roja hukum kîrinê hukum li wan bike, veşartîna wan ji dizane.

(II. Petrûs 2: 4, 9)

Eger hûn kelama XUDAN guhdari nekin, û li dijî emirê XUDAN re isyan bikin, wê demê destê XUDAN wê li hember we be.

(I. Samûyêl 12, 15)

isa Mesih got:

Eger kesek bi min re nesekine, mina şivmêwê wi davêjin der û hişk dibe. Wan top dikin davêjin nav agir û ew diiewitin.

(Yûhenna 15, 6)

KESÊ KU DIXWAZE XWEDÊ NAS BIKE, GEREKE KU EW LI Wî BIGERE

XUDAN emir dîke: "Li Min bigerin û dema ku hûn bi hemû dilê xwe li min bigerin, hûnê min bibinin.

(Yêremya 29, 13)

Eger mina ku tu li ziv digeri tu wisa li Wî bigeri, tê hikmeta XWEDÊ bibini.

(Methelokên Silêman 2, 4-5)

Bixwazin û hûnê bistinin; bigerin û hûnê bibinin; li deribixin û deriyê li ber we vebe.

(Met 7, 7)

Xeyri iman kîrinê razi kîrina XWEDÊ bêimkan e. Ji ber ku yê ku nêzikê XWEDÊ dibe, gereke ew beri bi hebûna Wî iman bike û piitre ji iman bike ku, XWEDÊ xelat dide yên ku li Wî digerin.

(ibr 11, 6)

Ez yên ku ji min hez dikin hez dikim û yên ku zû li min bigerin, ewê min bibinin.

(Methelokên Silêman 8, 17)

XUDAN rinde, bo canê ku li hêviya Wî disekine û lê digere.

(Mersiyeyên Yêremya 3, 25)

XWEDÊ, insanên hemû welatan ji yek bavi xuliqandîye. Wisa ku li XWEDÊ bigerin, lêgerin û Wî bibin in. Ew qet ji me keseki dûr nine.

(K. şandîyan 17, 26-27)

Lê belê ez, ez li XWEDÊ digeriyam û min xebata xwe ji XWEDÊ re dihiit.

(Eyûb 5, 8)

XWEDÊ DIXWAZE EM WERINE CEM Wî

Ji ber ku Xudayê we XUDAN merhamet dîke û dilê Wî li mirov diiewite, eger hûn li Wî vegehin, Ew rûyê xwe ji we nazivirine.

(II. Tarix 30, 9)

Ya XUDAN tu rindi û yê ku ef dîke Tu yi. Tu bo hemû kesên ku bang te dikin zêde merhamet diki.

(Zebûr 86, 5)

Nêzikê XWEDÊ bibin û Ewê nêzikê we bibe.

(Yaqûb 4, 8)

XUDAN nêzikê hemû kesên ku bang Wî dikin e. Ewê ku bi rasti bang Wî dikin.

(Zebûr 145, 18)

XUDAN dibêje: "Niha werin ku em bî hev re dawa xwe bibinin. Eger sûcên we sor, sor be, mina berfê sipi dibe. Eger mina buxika qirmiz sor be, wê bibe mina livayê.

(Îşaya 1, 18)

isa Mesih dibêje: Werin cem mîn, ya hemû kesên westiyayi û bargiran û ezê rehetiyê bidim we. Nirê mîn hildîne ser xwe û ji mîn hin bibin, jî ber ku ez nefspiçûk û dilmilahirim im û hûnê ji nefsa xwe re rehetiyê bibinin.

(Met 11, 28-29)

Yên ku werin cem mîn, ez wan qet nakim der.

(Yûhenna 6, 37)

XWEDÊ PÎROZ E

Ya XUDAN, mina Te ki heye? Di pirozbûnê de tu mezin i.

(Derketin 15, 11)

Tu kes mina XUDAN piroz nine. Jî ber ku xeyri te yeki dîn tune.

(I. Samûyêl 2, 2)

Haia ku, XWEDÊ xirabiyê bike û Yê ku pekarê her tiitîye, neheqiyê bike!

(Eyûb 34, 10)

XUDANÊ ordiyan piroz e, piroz e, piroz e; tamamê dinê bî mezinahiya Wi tiji ye.

(Îşaya 6, 3)

Jî ber ku Yê ku bîlînde û bîlînd bûye, di abediyetê de rûniitîye û navê Wi piroz e wisa dibêje: "Ez di cihê bîlînd û piroz de rûdînim.

(Îşaya 57, 15)

XUDAN di hemû rêyên xwe de adil e; û di hemû xebatên xwe de dilbirehm e.

(Zebûr 145, 17)

Ji XWEDÊ pêve kesek qenc tune.

(Marqos 10, 18)

Ma ki jî navê te natirse? Ki Wi bîlînd nake, ya XUDAN! Jî ber ku tenê Tu piroz i.

(Wahi 15, 4)

JİYANA BÎ XWEDÊ RE PÎROZ E

Tu iman diki ku XWEDÊ yek e, tu rind diki. Cin jî ji vîna re iman dîkîn, û dilerzin. Ey mirovê betal, ma tu dixwazi hin bibi? Xwe bî xwe nexapinin û nebin yên ku tenê Kelamê dibihizin, lê belê bibin yên ku Kelamê dîkîn.

(Yaqûb 2, 19-20 û 1, 22)

Tev herkesi li aiitîyê bigerin û li dû qutsiyetê herin, ya ku bêyi wê tu kes nîkare ku XUDAN bibine.

(ibr 12, 14)

Yê ku dibêje ez XWEDÊ nas dikim û emirên XWEDÊ nagire, derewker e û rasti li ba wi tune. Zarokên XWEDÊ û zarokên iblis bî vîna tîne nas kîrin. Yên ku rastiyê nakin û jî birayê xwe hez nakin, ne jî aliyê XWEDÊ ne.

(I. Yûhenna 2, 4 û 3, 10)

XUDAN jî rêya mirovê xirab nefret dîke; lê belê jî yên ku li dû rastiyê diçin hez dîke.

(Methelokên Silêman 15, 9)

Yê ku bang we kirîye çawa piroz e, hûn jî di her heraketên xwe de mina zarokên itaetê piroz

bın.

(I. Petrûs 1, 15)

Ne li xirabiyê li rindiyê bigerin ku, hûn bijin. Wisa XUDAN, Xudayê ordiyan, mina ku hûn dibêjin wê bî we re be.

(Amos 5, 14)

EMIRÊN XWEDÊ

Ey mirov, (XWEDÊ) rasti ji te re got; tu rastiye bike, ji merhamet kirinê hez bike û bî dîlnizmi li tev Xudayê xwe bimeşe! Ma ji xeyri vêna, XUDAN ji te çi dixwaze?

(Miia 6, 8)

Hûn piroz bın; ji ber ku ez Xudayê we XUDAN piroz im.

(Bavikê Lêwi 19, 2)

Xudayê xwe Xudan bî hemû dilê xwe, bî hemû canê xwe, bî hemû quweta xwe, û bî hemû fikrê xwe hez bike. Ji ciranê xwe ji mina xwe hez bike.

(Lûqa 10, 27)

Tu emiran dizani: Nekuje! Zina neke! Diziyê neke! Bêbextiyê neke! Heqê kesi nexwe! Qedira dê û bavê xwe bigire!

(Marqos 10, 19)

Weki vê dinyayê nebin; lê belê ji bona ku hûn irada XWEDÊ ya rind, hêja û kamil ferq bıkın, bî nûbûna fikrên xwe werin guhartin.

(Rom12, 2)

Ev kitêba ierietê wê ji devê te veneqete; ji bona ku te hay jê hebe ku tu li gora hemû tiitên ku tê de hatine nivisandin biki, iev û roj tê wê bifikiri. Ji ber ku hingê tê rêya xwe vekî û bî serkevi.

(Yêşû 1, 8)

Bî Xudan iman bıkın!

(Marqos 11, 22)

TIITÊN KU XUDAN JÊ NEFRET DIKE

iei tiitên ku XUDAN jê nefret dike hene, û heft tiitên mekruh ji bo canê Wi hene:

Çavên bılind, zimanê derewçin, û destên ku xwina bêşûc dirijinin ; dilê ku fikrên xirab saz dike, lingên ku ji bo xirabiyê lez dıkın, iahidê derewin yê ku derew qise dike, û yê ku li navbera biran de bêrêziyê çêdike.

(Methelokên Silêman 6, 16-19)

Ji ber ku ez XUDAN, ji edaletê hez dikim; ji fesadiyê û îelandinê nefret dikim.

(Îşaya 61, 8)

Lê belê yên tirsonek û yên bêiman, yên mekruh, yên qetil û yên ku zinayê dıkın û yên sihirbaz û pûtperist û hemû derewçin, para wan di gola ku bî agir û kukurt diiewite de ye. Mırına diduyan ev e.

(Wahi 21, 8)

Hûn ji ruhê xwe bîparêzin, û bila kesek li jina xwe xayintiyê neke. Ji ber ku XUDANÊ israêl XWEDÊ dibêje: "Ez ji jinberdanê nefret dikim."

(Melayaxi 2, 15-16)

Bila kesek hember ciranê xwe di dilê xwe de xirabiyê saz meke; û ji sonda derew hez nekin; ji ber ku ez ji van hemû tiitan nefret dikim, kelama XUDAN.

(Zekerya 8, 17)

INSAN NIKARE EMIRÊN XWEDÊ BÊXETA BÎNE CIH

Lê belê ez we dizanim; di hundirê we de hezkırina XWEDÊ tune.

(Yûhenna 5, 42)

Ji ber ku eger kesek temamê şerietê pêkbine, lê belê di yekê de xeta bike, li hember hemû şerietê sûcdar e.

(Yaqûb 2, 10)

Wê demê min wisa got: "Ax li min! Ez mehf bûm. Ji ber ku ez mirovek lêv mirdar im, û li nav gelê lêv mirdar de rûdînim. Ji ber ku çavên min Padiiah, Xudayê ordiyan dit."

(Îşaya 6, 5)

Ki ku rindî kirinê zane û nake, ev ji bo wi guneh e.

(Yaqûb 4, 17)

Mina ku hatiye nivisin: "Tu kes rind tune, heta iexisek ji tune."

(Rom 3, 23)

Kesê ku rindiyê nake bî XWEDÊ re nine. Kesê ku birayê xwe insan hez nake ji bî XWEDÊ re nine.

(I. Yûhenna 3, 10)

Me hemûyan mina miyan rê iai kır; û em her yek veşeriyar li ser rêya xwe.

(Îşaya 53 6)

Ma ki dikare li ber vi Xudayê piroz, XUDAN bisekin e?

(I. Samûyêl 6, 20)

EM BI CEHD KIRINA XWE NIKARIN BA XWEDÊ DIRUST BIBIN

Ji ber ku ez ji bo wan iehadet dikim ku, ji bo XWEDÊ cehd kirina wan heye; lê belê li gora zaninê nine. Ji ber ku ew rindiya XWEDÊ nizanin û bî ya xwe cehd dikin û wisa nebûn girêdayiya rindiya XWEDÊ.

(Rom 10, 2-3)

Ji ber ku em hemû bûn mina mirdar, û hemû xebatên me yê rind mina kincên qirêj in.

(Îşaya 64, 6)

Ji bo mirovê çê: "Dema ku min got, ewê mutleqa bijî, ew li rastiya xwe ewleh bibe û xirabiyê bike, qet biranina xebatekê wi, yê ku rindin; nabe. Bona xirabiyê ku kırîye, ew dîmir e.

(Hêzekiêl 33, 13)

Yên ku li gora xwestina bedenê dikin, nikarin ku XWEDÊ razi bînin.

(Rom 8, 8)

Ji ber ku tu kes li ba XWEDÊ, bî kirina karên şerietê dirust nabe.

(Rom 3, 20)

Ez nikarim ku ji bo tîşteki bêjim; ev serfiraziya me ye. Lê belê serfiraziya me, ji XWEDÊ ye.

(II. Kor 3, 5)

GUNEH ME JI XWEDÊ VEDIQETINE

Guneh bî destê miroveki (Adem) kete dinê, û mîrîni ji bî destê guneh kete dinê. Bî vi awayî mîrîni ji derbasi hemû insanan bû. Ji ber ku hemûyan guneh kırin.

(Rom 5, 12)

Xwestin avîs dibe û guneh diwelidîne; û gehiitina guneh ji mîrînê diwelidîne.
(Yaqûb 1, 15)

Canê ku guneh dîke, yê ku bîmire ew e.

(Hêzekiêl 18, 20)

Lê belê gunehên we cihêti kîr navbera we û Xudayê we, û sûcên we rûyê Wi ji we da vîartî
ku Ew we nabîhîz e.

(Îşaya 59, 2)

Yê ku di rastîyê de disekîne digihîje jîyanê û kesê ku li dû xirabîyê tere dimire.

(Methelokên Silêman 11, 19)

XWEDÊ wisa dibêje: "Ma hûn çima ji emirên XUDAN derdikevin û xebata we pêi de naçe?
Jî ber ku we XWEDÊ hiit. Ji ber vê yekê Wi jî hûn hiitin.

(II. Tarîx 24, 20)

Jî ber ku îsyana min sûcê falbêjê ye; û inadkirin jî mina pûtperstî û kotîtiyê ye. Madem ku te
kelama XUDAN red kir, Wi jî tu red kirî.

(I. Samûyêl 15, 23)

HIRSA XWEDÊ LI HEMBER GUNEH'YE

XWEDÊ hakîmek adîl e. Erê, Xudayê ku her roj hêrsê nişan dide.

(Zebûr 7, 11)

XUDAN dereng hêrs dîkeve, û di quwetê de mezin e. Ew, yê sûcdar tu car bê sûc dernaxe.

(Nehûm 1,3)

Bî hemû neheqî, neqenci, temayî, xirabîyê tîjî bî hesûdî, mêrkujî, gazînd, hîle û cîrnexweîyê
tîjî; xirabîbêj, sebker, jî XWEDÊ nefretker, zimandîrêj, qure, pesnok, sazkarên xirabîyê,
neguhdarên gotîna dê û bavan, bêfehîm, yê ku soza xwe nagîrin, yê hezkîrin di dilê wan de
tune û dil bêrehmîn. Bî ser ku dizanîn yê ku van tiîtan dîkîn mîrîn heq kîrine, disa tenê bî
kîrîna van tiîtan namînin, lê wanên ku van dîkîn jî erê dîkîn.

(Rom 1, 29-32)

Jî ber evan tiîtan hêrsa XWEDÊ tê ser wan mîrovên ku Kelamê guhdarî nakîn.

(Kol 3, 6)

Lê belê li hember mîrovên ku bî neheqî jî heqîqetê re manî bûn e, xiîma XWEDÊ jî jor de bî
eîkereyî tê xuya kîrin.

(Rom 1, 18)

HIKUM HEYE

Jî bo insanînan carekê mîrîn, piître bê çreye wê bîn hukûmkîrin.

(ibr 9, 27)

Dema mîrov bikewe destê Xudayê jîndar, tîştêkî bî tîrsehêz e.

(ibr 10, 31)

Ez jî we re dibêjim, roja axretê mîrov jî bona her xeberek vala ku xeber didîn, wê hesap bidîn.

(Met 12, 36)

Jû pê ve mîn mêze kîr; mîrîyên mezin û piçûk, li ber text sekinîn e. Kitêb hatîn vekîrin. Û
kitêbek dîn jî, kitêba jîyanê hate vekîrin. Li gora tiîtên ku di kitêban de hatîbûn nivîsîn hukûmê
mîrîyan kîrin. Û her kî di kitêba jîyanê de nehatîbûn nivîsîn ew avêtîn gola agir.

(Wahî 20, 12-15)

Jî ber ku rînd be xîrab be, XWEDÊ li tev her tiîtê vîartî her xebatekê jî dide hukûm kîrin.

(Waiz 12, 14)

Axirîya dinyayê ji wê wisa be. Melayket wê derkevin, wê xiraban ji nav rindan bibjêrin û bavêjin agirê firinê. Li wir wê bibe giri û qirçiniya diranan.

(Met 13, 49-50)

EM NIKARIN XWE LI BER XWEDÊ VEIÊRININ

Çavên XUDAN, li her derê yên xirab û yên rind raçav dîkin.

(Methelokên Silêman 15, 3)

Ya XUDAN, Te ez tecrube kırım û Te ez nas kırım. Tu rûniitin û rabûna min dizani; fikrê min ji dûr ve fehm diki. Rêya min û şunda raketina min ji hev diki der. Tu hemû rêyên min bai dizani. Ji ber ku hê sozek li ser zimanê min neyi, erê, ya XUDAN, Tu wi bi temami dizanî.

(Zebûr 139, 1-4)

Ji ber ku XUDAN mina ditina mirovan nabin e; ji ber ku insan li rû dinêre, lê XUDAN li dîl dinêre.

(I. Samûyêl 16, 7)

Yê ku guh xulq kirîye, ma ew nabihize? Û yê ku çav çêkirîye, ma nabine?

(Zebûr 94, 9)

XWEDÊ dibêje: Ji ber ku çavên min li ser hemû rêyên wan e. Li ber rûyê min vîartî nin in. Kotitîya wan li ber çavên min nehatiye vîartinê.

(Yêremya 16, 17)

Qet mexlûqatek nîkare ku xwe li ber XWEDÊ veiêrine. Lê li ber çavên Yê ku em berpîrsiyarin, li ber Wi hesab bidin, her tiit bi hemû tazi bûnê eikere ye.

(ibr 4, 13)

TOBE KIRIN MECBÛR E

XWEDÊ dibêje: Ma ez ji mîrîna mirovê xirab zewqê digirim? Ma ne hê zêde ew ji rêya xwe vege e û bijî? Kelama XUDAN Yahwê.

(Hêzekiêl 18, 23)

Ji we re dibêjim na, lê belê dema ku hûn tobe nekin, hûnê hemû wisa helak bibin.

(Lûqa 13, 3)

Ki ku gunehên xwe veiêrine serfiraz nabe; lê belê yê ku gunehên xwe itiraf bike û cih bihêle, merhametê dibine.

(Methelokên Silêman 28, 13)

Lê belê niha ji, XUDAN dibêje, bi hemû dîlê xwe, bi roji, bi girin û bi li xwe xistin wegerin; û ne kincên xwe lê dîlê xwe qî bîkin, û vegezin ba Xudayê xwe XUDAN. Ji ber ku Ew merhamet dîke, û zehf ber we dikeve; dereng xiim dîke, û bexi kîrîna Wi zehf e.

(Yowêl 2, 12-13)

Bi xwe re sozan bigirin, vegezin ba XUDAN û ji Wi're wisa bibêjin: "Her kotitîyê ef bike, û me bi kerema xwe qebûl bike!"

(Hoieya 14, 2)

Mîna gunehên te mîna ewrê rei û sûcên te ji mîna mijê paqîj kirin, vegere ba min; ji ber ku min tu bi fidye rizgar kiri.

(Îşaya 44, 22)

MIROV BI TOBE KIRINÊ TÊ EF KIRIN

Hê XUDAN tê ditinê li Wi bigerin; hê nêzike bang Wi bıkın; bila mırovê xirab dev ji rêya xwe, û yê neheq ji dev ji fikrê xwe; û vezerin ba XUDAN û ji we re merhamet dıke. Ê bila ew vegere ba Xudayê me, ji ber ku Ew zêde zêde ef dıke.

(Îşaya 55, 6-7)

XUDAN nêzikê yê n dil xemgin e û yê n ku di ruh de dilêin ji rizgar dıke.

(Zebûr 34, 18)

Bı navê Wi ji bona hemû miletan ef bûna guneh tê ilan kirin.

(Lûqa 24, 47)

Mın sÛcê xwe ji Te re got û kotitıya xwe nevêart. Mın got, ez ji XUDAN re isyanên xwe bibêjim; û te sÛcê gunehê mın ef kır.

(Zebûr 32, 5)

Eger em gunehên xwe eikereyi bibêjin, Xudayê dılsoz û adil, gunehên me ef dıke û me ji her kotitıyê paqij dıke.

(I. Yûhenna 1, 9)

Bı vi awayı bona ef bûna gunehên xwe tobe bıkın, û vezerin ba XWEDÊ.

(K. şandıyan 3, 19)

Tobe kirin ev e, ku mırov gunehên xwe eikereyi ji XWEDÊ re bibêje û guneh kırinê ji cih bihêlin e.

JI BO AİTıYA RAST QURBAN LAZIM E

Ewê destê xwe dane ser serê qurbana iewitandinê; ewê ji bo wi berdêl bê qebûl kirin. Ji ber ku canê goit di xwinê de ye; mın ew li ser gorıgehê ji bo ef bûna canê we da we.

(Bavikê Lêwi 1, 4 û 17, 11)

Li gora şerietê hema her tiit bı xwinê paqij dıbe. Eger xwin neherike ef bûn tune.

(ibr 9, 22)

Bila berxa we bêqisûr, nêr û yek sali be. Wi devdevê êvarê serjê bıkın. Xwinê li ser malên xwe bireşın, ji bo we nişan e. Dema ku ez xwinê bibinim, ezê li ser we re derbaz bibim û ji bo mehf bûnê kotitı nayê li ser we.

(Derketın 12, 5 û 13)

ibrahim wisa got: "Lawê mın, ji bo qurbana iewitandinê, XWEDÊ bı xwe wê berxê temın dıke." Ê ibrahim çavên xwe bılind kır û dit; va ye, pai wi de beranek bı qocê xwe hatiye girtin; û çû beran girt û iuna lawê xwe de ji bo qurbana iewitandinê ew serjê kır.

(Destpêkırin 22, 8 û 13)

İSA MESİH BERXÊ XWEDÊ YE

Dortira rojê, Yehya dit ku isa ber bı wi ve tê û wi wisa got: "Va ye, Berxê XWEDÊ yê ku gunehên dinê ji holê hiltine!"

(Yûhenna 1, 29)

XUDAN kotitıyên me hemûyan danin ser Wi. Bı Wi miamela xirab kirin, lê belê dema ku ew nizm bû, wi devê xwe venekır; mina berxê ku bo serjêkırinê birine, û mina mıya ku li ber hevrıngvanan bêzıman disekine, devê xwe venekır.

(Îşaya 53, 6-7)

Bı xwina nêri û ciwangan nine, lê belê bı xwina xwe bı carekê kete cihê piroz. Bı vi awayı, bona ku Mesih sÛcên pir kesan bikêine, Ew yek carê bû qurban.

(ibr 9, 12 û 28)

Hûn zanin ku, hûn bî ziv, bî zêr an ji bî daetên xwe yê pûç yê ku ji kal û bavan mane rizgar nebûn. Lê belê hûn bî xwina Mesih ya biqimet rizgar bûn; Êw mina bexê bêqisûr û bêleke ye.

(I. Petrûs 1, 18-19)

Bî vi awayi yê ku bî wasita Ruh ê abadin xwe bî xwe bêleke ji XWEDÊ re kire qurban, ji berko hûn ji Xudanê sax re ibadet bîkîn, xwina Mesih wijdana we ji xebatên miri çiqas zêde paqij dîke!

(ibr 9, 14)

RIZGAR BÛN TENÊ BI ALIKARIYA XWEDÊ MIMKÛN E

Mîrov bêberdêl, bî alikariya merhameta XWEDÊ rast têne hêjmartin. XWEDÊ Mesih kîr qurban ku, kî iman bî xwina Wi bine gunehên xwe bî ef kîrin û wisa edaleta xwe nişan da.

(Rom 3, 24-25)

Lê belê XWEDÊ hezkîrîna xwe ji bo me bî vîna îspat kîr, jî ber ku dema em hê gunehkar bûn, Mesih jî bona me mir. Bî vi awayi em niha bî xwina Wi rast hatin hêjmartin, û bî wasita Wi hê zêde emê jî xezebê xelas bibin.

(Rom 5, 8-9)

Jî ber ku hûn bî wasita imanê bîmerhametê rizgar bûn. Êw serefraziya we nine, lê belê xelata XWEDÊ ye. Bila kes xwe meth neke, jî ber ku ev bî xebatên rind nine.

(Efes 2, 8-9)

Hemû Peyxamber derbareyi Wi de îhadetî dîkîn, ku her kî bî isa iman bike, bî navê isa gunehên wî tî ef kîrin.

(K. şandîyan 10, 43)

Xeyrî (isa) kesekî dîn de xelasbûn tune. Jî ber ku bî ezmên de navekî dîn jî mîrovan re nehatiye dayin, ku em bîkarîbîn bî wî xelas bîn.

(K. şandîyan 4, 12)

JI BO BÛYÎNA İSA MESİH XEBER HATE DAYİN Ê

Di meha şeşan de XWEDÊ Cebrail melayket şande bajareki Celilê, ku navê wî Nîsret bû, ba keçîkekê ku dergîstiya mîroveki, navê wî Ûsiv bû. Ûsiv jî mala Dawid bû. Navê keçîkê jî Meryem bû. Cebrail hat ba wê û jê re got: "Silav li te, ya keçîka ku gehîtiye merhameta XWEDÊ. Xudan bî te re ye. Meryem bî vê silavê iai ma û fikîrî, ka ev çî silav e? Melayket jê re got: "Ya Meryem, netirse! Tu gehîti merhameta XWEDÊ. Mêze, tu ducan bibi û tu lawekî bîni û navê wî isa dayni. Êwê mezin be û jê re 'Lawê Yê Herî Bîlînd bê gotin... û dawîya padiyahîya wî nebe. Meryemê jî melayket pîrs kîr: "Ma evê çawa çêbibe? Jî ber ku tu mîr nêzîkî mîn ne bûne." Melayket jê re got: "Ruh'ê Pîroz wê bê ser te, quweta Yê herî bîlînd jî te re sih bike; û jî ber vê yekê ew pîrozê ku jî te bîwelîde, wê jê re Lawê XWEDÊ tê gotin...Jî ber ku jî bo XWEDÊ tu tiitek bêimkan tune." Meryemê got: "Mêze, ez carîya Xudan im, bila mina ku te got, jî mîn re bibe." Û dû re melayket jî cem wê çû.

(Lûqa 1, 26-38)

Adem û Mesih, her du jî bêalîkariya cînsî hatin dînê. Lê belê Adem guneh anî dînê, lê belê isa li hember guneh zafer temîn kîr. şîkîr be jî Wî're! Amin.

İSA MESİH Kİ YE?

Ew Mesihê ku bî rasti XWEDÊ bû, disa ji Wi ev heq cih hiit; bî xwe bû qûl û di lêçûna mirov de hate dinê; û wisa xwe nizm kîr. Ew di iiklê mirov de hate ditin û heta bî mîrîna ser xaçê razi bû û xwe nizm kîr.

(Fil 2, 6-8)

isa got: Ez û Bav yek in. Bav ez pîroz kîrim û şandim dinê. Wê çaxê bona ku mîn got ez Lawê XWEDÊ me, ma hûn çawa ji mîn re dibêjin ku te kufr kîr?

(Yûhenna 10, 30 û 36)

isa Mesih Soza abadin e, û di destpêke de heta niha Ew e. XWEDÊ Ew bî mûcize li zikê keçik Meryemê de ani wicûd kîrin ê. Bedenê de jê re tê gotin Lawê insan, di Ruh de ji Lawê XWEDÊ. Girêdaniya XWEDÊ herdem bî Soza Wi ya xwei, isa Mesih're hebû. Ber vê yekê kitêba pîroz ji bo isa Mesih Law û ji bo XWEDÊ ji Bav dibêje.

Bî vi awayî, dema ku Mesih hate dinê wisa got: Lê belê Te (XWEDÊ) ji mîn re bedenek hazîr kîr.

(ibr 10, 5)

Xudanê me isa Mesih, li gora Ruh ê pîroz ji mîrînê rabû û bî qudrêtê hate ilan kîrin, ku Ew Lawê XWEDÊ ye.

(Rom 1, 4)

Tomas ji Wi re got: "Xudanê mîn û Xudayê mîn."

(Yûhenna 20, 28)

Mezin bûna sîra rêya XWEDÊ bêîik e. Ew, di bedenê de hate eikerekîrin ê.

(Tîm 3, 16)

Jî ber ku hemû tîji bûna XWEDÊ, li gora bedenê di Mesih de mevcût e.

(Kol 2, 9)

Jî me re zarokê bû, lawek ji me re hate dayin; û serwerî li ser milê Wi ye, û navê Wi: şîretkarê nuwaze, Xudayê bihêz, Bavê bêdawitîyê, serokê dîlxweiyê tê bang kîrin.

(Îşaya 9, 6)

isa ji wan re got:..."jî berî ku îbrahîm hebe EZ HEME."

(Yûhenna 8, 58)

Jîyan Wi de bû û jîyan ronahîya insanan bû. Lê Nura hati dinê ya ku her insani ronahi dîke, Nura rast hebû. Ew dinê de bû û dinê bî Wi hate hebûnê, lê belê dinê Ew nas nekîr.

(Yûhenna 1, 4 û 9-10)

Jî ber ku XWEDÊ yek e, navbera XWEDÊ û insên de jî yek navçîker heye. Ew jî isa Mesih e. Ew bû insan û xwe jî bo herkesî kîre qurban.

(I. Tîm 2, 5-6)

Xelasiya me û ef bûna gunehên me bî Wi ye. Ev sûretê Xudayê neditbar e û Nixworiyê hemû efirîna ye.

(Kol 1, 14-15)

KITÊBA PÎROZ KELAMA XWEDÊ YE

Jî ber ku kelama peyxambertîyê tu car bî xwestîna mirovan nehatiye, lê belê mirovên ku bî Ruh'ê pîroz tîji bûn, jî XWEDÊ gotin.

(II. Petrûs 1, 21)

Mîna ku (XWEDÊ) jî berê ve bî devê peyxamberên pîroz qîse kîriye...Jî bo xeber dana ef bûna gunehên gelê xwe...

Lûqa 1, 73 û 77)

Ruh'ê XUDAN bî wasîta mîn qîse kîr, û kelama Wi li ser zîmanê mîn bû.

(II. Samûyêl 23, 2)

Hemû nivîsên pîroz ilhama XWEDÊ ne. Ji bo hin bûn, rexne kîrin û bo terbiye kîrîna rasti ji feydedar e.

(II. Tîm 3, 16)

Û ev gotinê ku mîn iro ji te re emir kîrine, bila ew li dilê te de bîn

(Lêvegerandin 6, 6)

Ji ber ku ji berê çî hatîye nivîsin, ji bo hin bûna me ye; da ku, bî dîfirehti û bî teseli kîrîna kitêbê hêvîya me hebe.

(Rom 15, 4)

Hûn ji rê der ketin e, ji ber ku hûn ne nivîsên pîroz zanin û ne ji qudreta XWEDÊ.

(Met 22, 29)

Ji ber ku Te kelama xwe li ser hemû navûdengê xwe re bilind kîr.

(Zebûr 138, 2)

ISA MESIH KELAMA XWEDÊ'YE

Kincê ku dî xwinê de noqandîye li xwe kîriye û navê Wi: KELAMA XWEDÊ'ye.

(Wahi 19, 13)

Destpêkê de Kelam hebû. Kelam tev XWEDÊ bû û Kelam XWEDÊ bû. Kelam bû insan û li nav me de jiyin kîr.

(Yûhenna 1, 1 û 14)

ISA MESIH XWEDÊ DIDE NAS KIRIN

Qet insaneki tu caran XWEDÊ neditîye. Lê belê Lawê Wi yê delal yê ku bî Xwe ji XWEDÊ ye û hemêza XWEDÊ de ye, Wi XWEDÊ daye nas kîrin.

(Yûhenna 1, 18)

Ji ber ku: Xudayê ku dibêje nur li tariyê de ronahi dîke, di rûyê isa Mesih'de ji bo dayîna bîlîndîriya zanîna nûra XWEDÊ, li dilê me de ronahi kîr.

(II. Kor 4, 6)

XWEDÊ BI NAVBERIYA ISA MESIH DIAKIFÊ

XWEDÊ demên berê gelek caran û bî pîr rêyan ji kalikan re qise kîr. Lê belê dawîya van rojan de bî wasîta Law ji me re qise kîr. XWEDÊ Ew kîr mêrasxwerê her tîştî û bî navçîtiya Wi hemû kainat xulîqand.

(ibr 1, 1-2)

Ez ji tîitê ku li ba Bavê xwe dibînim dibêjim.

(Yûhenna 8, 38)

KELAMA NIVISANDIN Û KELAMA XWEI

Nivîsên pîroz ji bo Ruh Xwarinek in

Mîn ji daxwaza xwe zêdetir, kalamên devê Wi helanin.

(Eyûb 23, 12)

Mîrov tenê bî nan najî, lê bî her xebera ku ji devê XWEDÊ derdikeve diji.

(Met 4, 4)

Nivîsên pîroz rêya me ronahi dîkîn

Kelama Te ji bo gavên mîn çira û ji bo rêya mîn ronahi ye.

(Zebûr 119, 105)

Vebûna Kêlamê ronahi dîke; û aqil dide mirovên kêmaqil.

(Zebûr 119, 130)

isa Mesih nanê jin e û li jor de hatiye xwar

isa got: Nanê ku ji jor de hatiye xwar, nanê sax Ez im. Eger kesek vi nani bixwe, abediyen diji. Nanê ku ez ji bo jiyana dinê de didim ji, Bedena mîn e. Nanê jiyane Ez im.

(Yûhenna 6, 51 û 48)

isa Mesih Ronahiya dinê ye

Jiyan di Wê de bû û jiyan ronahiya insanan bû. isa disa dengê xwe bilind kir û ji xelkê re got: "Ez ronahiya dinê me. Kesê ku li dû min were, ew di tariyê de nameie û dibe xwediyê ronahiya jiyane.

(Yûhenna 1, 4 û 8, 12)

KELAMA PÎROZ MEHSÛL DIDE JIYAN Ê

Lê belê kêfa wi di şerîeta XUDAN de ye. iev û roj şerîeta Wi kûr difikire. Mina dara li ber avê ye, di wextê xwe de mehsûlê xwe dide û pelê wê reng navêjin; her karê ku ew dîke ji rind diçe.

(Zebûr 1, 2-3)

isa Mesih Jiyanê bî mehsûl tiji dîke

Hûn bî Min re bisekinin û ez ji bî we re. Eger ku iivmêw bî mêmê ve nesekine, bî xwe nîkare meywe bide. Mina vê, eger ku hûn bî mîn re nesekinin, nîkarin meywe bidin. Ez mêm im, hûn ji iivmêw in. Kesê ku bî mîn re disekin e, ez ji bî wi re bisekinim û ew pîr meywe dide. Ji ber ku hûn bê mîn nîkarin tu tiştî bîkin.

(Yûhenna 15, 4-5)

KELAMA PÎROZ BEHSA İSA MESİH DIKE

Hûn Nivîsên pîroz dixwinin. Ji ber ku hûn zan dîkîn ku jiyana we ya abadin di wan de ye. Yê ku ji bo mîn iehadetiye dîkîn ji ew in. Eger ku we iman bî Mûsa bikirana, we wê iman bî mîn ji bikirana. Ji ber ku Mûsa derbarê Min de nivîsiye.

(Yûhenna 5, 39 û 46)

Mesih, ji Mûsa û ji hemû peyxamberan dest pê kir û ji wan re li nav hemû nivîsên pîroz de her tiştên ku derbareyi Wi de hatibûn nivîsandin, izah kir.

(Lûqa 24, 27)

KELAMA XUDAYÊ ABADÎN TU CAR NEHATE GUHARTIN

Ya XUDAN, kelama te li ezmanan her û her sabit e. Kelama te bî temami rast e; û her hukmê te abadin adil e.

(Zebûr 119, 89 û 160)

Gıya hışk dıbe, gul ji vedimırın; lê belê kelama Xudayê me heta hetayi disekin e.

(Îşaya 40, 8)

Kitêb xirab nabe.

(Yûhenna 10, 35)

Beri winda bûna erd û ezman, deqek yan ji herfeke piçûk ji ji şerietê winda nabe, heta ku hemû bêne sêri...

(Met 5, 18)

Hemû tiitê ku ji bo çêkirinê mın ji te re emir kırıye, wi pê bigir e. Qet tışteki bî wi re tevlihev neke.

(Lêvegerandin 12, 32)

Qet tışteki meke li tev kelama Wi, eger nine ku Ew çav li te bigerin e, tu wê derewçin derkewi.

(Methelokên Silêman 30, 6)

Yê ku dibêje kelimê bê qimet e, felaketê tine ser xwe.

(Methelokên Silêman 13, 13)

Eger ku mirovek ji kelama vê kitêba peyxambertiyê tışteki derxin e, XWEDÊ ji dara jıyanê ya ku di vê kitêbê de hatiye nivîsin û ji bajarê piroz para wi derdixin e.

(Wahi 22, 19)

İSA MESİH Bİ MIRINA XWE XWESTINA XWEDÊ ANİ İUNÊ

Bona ku ez canê xwe didim da ku ez disa iuve bigirim. Bona vê yekê Bav ji mın hez dıke. Kes nıkare canê mın ji mın bigire; lê belê ez wi bî xwe û xwe didim. Bo dayına canê mın û iûve girtına wi qudreta mın heye.

(Yûhenna 10, 17-18)

Eger ku te re ji jor ve nehatibûya dayin, qet selehiyeta te li ser mın wê tune bûya.

(Yûhenna 19, 11)

Ma ez nıkarım, ji Bavê xwe bixwazim, ku ew di vê gavê de ji donzdeh ordıyan zêdetir melayket bighine mın? Lê nivîsên piroz wê çawa bêne sêri, ku dibêjin, gerekê hemû awa bibin?

(Met 26, 53-54)

Li ser xwestına XWEDÊ, ku ji berêve hatibû ianikırin; isa kete dest we û we ji ew bî destê neheqan xaçê xist û kuit.

(K. şandıyan 2, 23)

Lê belê perçiqandına Wi ji Xudan're xwei xuyakır; Xudan, Ew xiste nav êian û canê Wi ji bo guneh hate dayin.

(Îşaya 53, 10)

DERBARÊ MIRINA İSA DE ŞEHADETIYA İAHIDAN

Li tev isa du eiqıya ji li çarmixê xistin. Yek li aliyê rastê, yê dın ji li aliyê çepê. Bı vi awayi, kelama ku dibêje Ew li tev yên sûcdar hate hêjmartin, hate iunê.

(Marqos 15, 27-28)

Wê demê esker hatin çaqên wan her du mirovên ku li tev isa hatibûn xaçkırin iikandin. Lê belê dema ku ew hatin cem isa, wan dit ku ew miri ye. Ji bo wê yekê eskeran çaqên wi

neiikandin. Lê belê, disa ji eskereki pê rimê teniita wi qul kır. Ji teniita wi hema xwin û av heriki. Ji ber ku ew tiit bona ku nivisa piroz: "tek hestiki wi naiike." were iundê, çebûn. Û disa niviseke dîn wisa dibêje: "Wê mêze wi mirovê ku wan bedena wi qul kırine, bıkın."

(Yûhenna 19, 32-37)

Ji saeta ieia heta saeta nehan dînê bû tari...isa disa bı dengeki bılınd kire gazi û ruh'ê xwe da. Erd hejıya, zinar qeliin, tirb vebûn. Çaxê sersed û ewên ku tevi wi nobe li isa digirtin, erdhej û ew hemû tiitê qewimi ditin, geleki tirsıyan û gotin: "Bı rasti eva Lawê XWEDÊ bû!"

(Met 27, 45 û 50-51 û 54)

ISA MESİH, MIRIN MEXLÛB KIR

Lê belê XWEDÊ êiên mırinê dan birrin û Ew ji mırinê rakır...XWEDÊ ev isa ji nav mırıyan rakır; û em hemû ji vêna re iahid in.

(K. şandıyan 2, 24 û 32)

Bı vı awayı, çawa insan bı xwin û goit hevpar bûne, Ew bı xwe ji mina wan ji vı tabieti re hevpar bû. Wisa da ku, bı mırına xwe, Wi yê ku quweta wi ya mırinê heye, yanê iblis mexlûb bike. Wisa Ew yên ku herdem bı tırsa mırinê bûne kole, hemûyan azad bike.

(ıbr 2, 14 û 15)

Ey mırın, ka zafera te li ku ye? Ey mırın, ka sitiriyê te li ku ye? Lê belê şıkır be ji XWEDÊ re, ku Wi bı wasita Xudanê me isa Mesih zafer daye me.

(I. Kor 15, 55 û 57)

isa Mesih got:

Yê sax Ez im; ez miri bûm û mêze, heta hetayê Ez sax im. Kilitên mırinê û dıyarê mırıyan bı mın re ne.

(Wahi 1, 18)

Lê belê bı xuyabûna xelaskarê me Mesih isa niha ev hatiye eikerekırin. Wi bı xwe di alikê de quweta mırinê pelixand, aliyê dın de ji jıyan û bêmırini derxist ronahiyê.

(II. Tım 1, 10)

MA QERARA ME JI BO İSA ÇAWA BE?

Mêze, ez li ber dêri ekinime û lêdixinim; eger kesek dengê mın bibhize û deri vebike, ezê herime ba wi. Ez bı wi re û ew ji bı mın re iivê bixwin.

(Wahi 3, 20)

Ema yê ku naiuxule, lê belê iman bı XWEDÊ anye, bo xatirê iman kırinê xelas dibe.

(Rom 4, 5)

Ruh'ê piroz bistin!...Bıxwazın, û hûnê bigirin. Wisa ku, iabûna we tamam bibe.

(Yûhenna 20, 22 û 16, 24)

isa got: Ki ku bavê xwe yan dıya xwe ji mın zêdetir hez bike, ne hêjayi mın e...Ji ber vê yekê isa ji iagirtên xwe re wisa got: "Her ki dixwaze, li pey mın bê, bila xwe inkar ke, xaça xwe hilde û li pey mın bê. Ji ber ku ki ku dixwaze, canê xwe xelas ke, ewê wê winda ke, lê ki ku canê xwe bona mın winda ke, ewê wi bibine."

(Met 10, 37 û 16, 24-25)

incil wisa dibêje: Eger tu bı devê xwe bı eikereyi bêji ku isa Xudanê te ye, bı dil ji iman biki, ku XWEDÊ Ew ji mırinê rakırıye, tu xelas dibi.

(Rom 10, 9)

Eger hûn yên Mesih'in, wê çaxê hûn nesilê ibarhim in. Li gora waadkırinê hûn mêrasxwer in.

(Gal 3, 29)

BI WASITA ÎSA MESÎH JIYANA ME NÛ DIBE

iehadeti ev e, ku XWEDÊ jiyana abadin daye me, û ev jîyan ji di Lawê XWEDÊ de ye. Ji ki re Law heye, jiyana wi ji heye; ji ki re Lawê XWEDÊ tune, jiyana wi ji tune.

(I. Yûhenna 5, 11-12)

Wisa ku eger kesek bî Mesih're be, mexlûqatek nû ye; tiitên kevn derbaz bûn, mêze, her tiit nûh bûn e.

(II. Kor 5, 17)

Jî ber ku bî Mesih Îsa re qanûna Ruh'ê jîyanê, ez ji qanûna guneh û mîrînê azad kirim.

(Rom 8, 2)

Ez li tev Mesih hatim xaç kirin; û êdi ez jin nakim, lê belê Mesih bî mîn re jin dîke. Û jiyana ku ez niha di bedenê de dijim ji, ji Lawê XWEDÊ re ez bî bawerkirinê dijim; ku Wi hez ji mîn kir û xwe ji bona mîn feda kir.

(Gal 2, 20)

Jî ber ku hûn bî toximê mirî nine, bî yê bêmirî, yanê bî wasita kelama XWEDÊ ya sax û baqî ji nû ve bûn. Mina zarokên ku nû bûne, hesreta iirê ruhani, yê bêhile bikîinin. Da ku hûn ji bo xelasîyê bî wi mezin bibin.

(I. Petrûs 1, 23 û 2, 2)

XWEDÊ JI ÎNSANÊN XWEDÎ ÎMAN RE BÛYE BAV

Û niha, ya XUDAN, Tu Bavê me'yi. Em lewe ne, û Tu kûz çêkerê me'yi; û em hemû xebata destê Te ne. Ya XUDAN, Tu Bavê me'yi. Ji ezelê bî vir de navê Te xelaskarê me ye.

(Îşaya 64, 8 û 63, 16)

Û di şunda ku ji wan re hate gotin hûn ne qewmê mîn in; wê ji wan re bê gotin: "Hûn zarokên Xudayê jin in."

(Hoieya 1, 10)

Hûn ku xirabin, zanin tiitên rind bidîne zarokên xwe, lê Bavê weyi ezmanan wê çiqas tiitên rind bide ewên ku ji Wi dixwazin!... Lê hûn wisa dua bikin: "Bavê me'yi ezmanan! Navê te piroz be."

(Met 7, 11 û 6, 9)

XWEDÊ di meskenê xweyi piroz de, Bavê sêwîyan û hakimê jinên bî ye.

(Zebûr 68, 5)

Ez we qebûl dikim. Û XUDAN, yê ku hakimi her tiitîye, dibêje: "Ez ji we re dibim Bav, û hûn ji mîn re wê law û qiz bin."

(II. Kor 6, 17-18)

Jî ber ku hemû kesê ku bî Ruh'ê XWEDÊ tîdare kirin, lawê XWEDÊ ne.

(Rom 8, 14)

EM BI NAVÇÎTIYA ÎSA MESÎH ZANIN KU XWEDÊ BAVÊ ME YE

Îsa ji wi re got: "Rê, rasti û jîyan ez im. Ne bî rêberîya mîn be, tu kes nîkare were cem Bav (XWEDÊ). Eger ku we ez nas bikirama, we Bawê mîn ji nas bikirana. Ji niha ve hûn Wi nas dikin, û we Ew dit...Ki ku ji mîn hez dîke, gotina mîn dîke, Bavê mîn ji ji wi hez dîke. Em ji tîdare ba wi û li cem wi mesken çêdikin."

(Yûhenna 14, 6-7 û 23)

XWEDÊ Lawê xwe şand...Wisa ku em ji bigihên heqê lawtîyê. Madem ku hûn law in,

XWEDÊ Ruh'ê Lawê xwe, yê ku dibêje: Abba! Bavo! şand dilê we. Wisa ku, êdi hûn ne qûl in, lê belê hûn law in. Ber ku hûn law in, bî wasita XWEDÊ mêrasxwer in. Jî ber ku hûn hemû bî wasita imanê bî Îsa Mesih're lawên XWEDÊ ne. (Gal 4, 4-7 û 3, 26)

Encax ew kesê ku iman bî navê Wî anin û Ew qebûl kîrin, Wî heq da wan hemûyan ku ew bibin zarokên XWEDÊ.

(Yûhenna 1, 12)

Eger ku yek guneh bike, li hîzûra Bav de parêzgerê me'yi çê, Îsa Mesih heye.

(I. Yûhenna 2, 1)

Jî ber ku bî wasita Mesih, em herdu ji bî yek Ruh'i derdikevin hîzûra Bav.

(Efes 2, 18)

ÎSA MESIH: ÇAVKANIYA HEZKIRINÊ, ŞABÛNIYÊ Û SILAMETÊ YE

Încil wisa dibêje: Mirovê ku hez nake, wî XWEDÊ nas nekirîye; jî ber ku XWEDÊ hezkîrin e...XWEDÊ hezkîrin e. Kî di hezkîrinê de bisekine, ew di XWEDÊ de sekine; û XWEDÊ jî di wî de disekine.

(I. Yûhenna 4, 8 û 16)

Û hevûdu re xêrxwaz û pîyar bibin. Mina ku XWEDÊ hûn bî Mesih're ef kîrin, hûn jî hevûdu wisa ef bîkî.

(Efes 4, 32)

isa got: Eger ku hezkîrîna we jî hevûdu re hebe, wê çaxê herkes wê fehm bike ku hûn iagirtên mîn in.

(Yûhenna 13, 35)

Ez dişa bî XUDAN re dilîa bibim, û bî Xudayê rizgar bûna xwe re bî dilîayi coiin bikim.

(Habakûk 3, 18)

Bî vi awayî, em bî imanê hatin bai kîrin û bî wasita Xudanê me, isa Mesih li ber XWEDÊ silameta me heye.

(Rom 5, 1)

Jî we re silametyê dihêlinim, ez silametya xwe didim we. Ez mina ku dinê dide nadim. Bila dilê we teng nebe û netirse.

(Yûhenna 14, 27)

ÎSA KESÊN KU ÎMAN KIRINE, JI MIRINÊ RADIKE

Eger Ruh'ê Ewê ku isa jî mîrînê rakir li nav we de disekine, Ewê ku Mesih isa jî nav mîrîyan rakir, Ewê bedena we ya fani jî bî wasita Ruh'ê ku li nav we de disekine, rake.

(Rom 8, 11)

Û XWEDÊ him Xudan isa jî mîrînê rakir, û him me jî bî qudreta xwe jî mîrînê ra dike.

(I. Kor 6, 14)

Jî ber ku xwestîna Bavê mîn ev e ku, hemû kesê ku Law ditine û iman bî Wî kîrine bigihên jîyana abadin. Ez jî wan di roja dawiyê de jî nûve rabikim.

(Yûhenna 6, 40)

isa jî wê re wisa got: "Qiyamet û Jîyan Ez im. Yê ku imanê bî mîn bine, ew bimire jî dişa jî dike. Yê ku jî dike û mîn re iman dike qet namir e.

(Yûhenna 11, 25-26)

Madem ku ez jî dikim hûn jî hûnê bijin.

(Yûhenna 14, 19)

Jî ber ku mîrîn bî wasita insan hat, rabûna mîrîyan jî bî wasita insan hat. Jî ber ku çawa hemû

di Adem de dimırın, wisa hemû bı Mesih're tên rakırın. Lê belê herkes dora xwe de; mehsûlê pêşi Mesih'e, li dû re ji di hatina Wi de yên ku yên Mesih'in.
(I. Kor 15, 21-23)

RIZGARİYA PİROZ İHMAL NEKIN

Eger kesek şerîeta Mûsa bêqedir bike, li ser ŞEHADETIYA du yan ji sê iahtidan gerek bêmerhamet bimire. Kesê ku Lawê XWEDÊ li bin lingê xwe de pan dıke, û ehda ku bı xwina Wi hatiye pirozkırın, erzan bike û heqeretê li Ruh'ê lutufkar bike, ma ewê çiqas zêde bibe layiqê ceza kırinê?

(ibr 10, 28-29)

isa Mesih got:

Lê belê ez ji we dostên xwe re dibêjim: Ji yên ku bedenê dikujın, û li dû re nıkarın tışteki dın bıkın, xof mekin. Lê belê ez ji we re bêjim, ku hûn ji ki xof bıkın: Ji yê ku li dû kuitinê re dıkare bavêje cehenemê xof bıkın. Erê, ez ji we re dibêjim, ji Wi xof bıkın.

(Lûqa 12, 4-5)

Yeki dın heye, Ew hukum li wan kesê ku mın qebûl nakin, dıke. Kelama ku mın got, di roja dawiyê de wê hukum li wi kesi dıke.

(Yûhenna 12, 48)

Erê, ji bo vê yekê mın ji we re got, hûnê li nav gunehên xwe de bimırın. Eger hûn iman nekin ku, ez Ew im, hûnê li nav gunehên xwe de bimırın.

(Yûhenna 8, 24)

Eger em xelasiya evqas mezin ihmal bıkın, ma emê çawa birevin û xelas bın?

(ibr 2, 3)

XWEDÊ HEMÛ XEBATA HUKUM KIRINÊ DA İSA

Jı ber ku XWEDÊ rojek tespit kırıye, di wê rojê de bı wasita mirovê ku Wi tayin kır, bı edalet hukum li dınê dıke. Wi, ew (isa) ji mırınê rakır û wisa ji hemû insanen re da isbat kırın.

(K. şandıyan 17, 31)

Bav hukum li kesi nake, Wi hemû xebata hukum daye Law. Wisa ku ew kesê ku Bav didın ieref kırın, Law ji bidın ieref kırın.

(Yûhenna 5, 22-23)

Jı ber ku gereke ku em hemû li ber kursiyê Mesih, yê hukum xuya bın. Da ku herkes, gerek rind gerek koti, li gora tiitê ku di bedenê de kırıye, wisa bistine.

(II. Kor 5, 10)

Ev hemû, dema ku Xudan isa di nav pêta agir de li tev melayketên xwe, yên xurt ji ezman de xuya bike û bê, çêdibin. Xudanê me isa, hemû kesên ku XWEDÊ nas nakin û incila derbareyi Wi de qebûl nakin, dide cezakırinê. Ev kesana, di roja hukum de ji hebûna Wi û bıındtırıya quweta Wi dûr dimınin û bı mehf bûna abadin tên cezakırın.

(II. Sel 1, 7b-9)

YÊN KU BI RASTİ İSA'RE İMAN NEKİRINE XELAS NABIN

Ew dibêjin ku em XWEDÊ nas dıkın; lê belê bı xebatên xwe Wi inkar dıkın.

(Tit 1, 16)

Ev gel bı zımanê xwe gazi mın dıke, lê belê dilê wan ji mın dûr e.

(Met 15, 8)

Ne ku ewê Ji mîn re dibêje: "Xudan! Xudan!" wê bikeve Padiiatiya Ezmanan, lê ewê bikevê, yê ku xwestina Bavê mîni ezmanan dike. Wê rojê gelek wê ji mîn re bêjin: "Xudan! Xudan! Ne me bî navê te cin derxistin û bî navê te gelek keramet kîrin?" Hingê ezê aikere ji wan re bêjim: "Dûri mîn herin, yê bî fesadi iuxul kîrine! Mîn hûn tu car nas nekîrin."

(Met 7, 21-23)

Eger ku di mirovekê de Ruhê Mesih tune be, ew mirov yê Mesih nine.

(Rom 8, 9)

Li ber te mîna gelê mîn rûdînin, û gotinê te guhdari dîkin, lê belê wan nakin. Jî ber ku bî devê xwe zehf dîlxwaz xuya dîkin, lê belê dilê wan li dû qezenca koti diçe.

(Hêzekiêl 33, 31)

YÊN KU IMAN BI İSA ANİNE GOTINA WI DİKIN

Jî ber ku em bî Mesih isa're hatin xuliqandin û em berhema Wi'ne. Da ku em wextê xwe pê xebatên ku XWEDÊ ji berê de hazir kîrine, derbaz bîkin.

(Efes 2, 10)

İsa, kamil bû û di aliyê XWEDÊ de li gora sazûmana Melkisedek serokê Kahinan hat tayin kîrinê. Wisa ji bo hemû kesên ku emirê Wi dîkin, Ew bûye çavkaniya xelas bûnê.

(İbr 5, 9-10)

Hûn ji guneh hatin azad kîrin û bûn xizmetkarên qencyê.

(Rom 6, 18)

Û eger ku Mesih bî we re ye, beden ji bo guneh miriye; lê belê ruh ji bona rastîya XWEDÊ sax e. Jî ber ku eger ku hûn li gora bedenê jin bîkin, hûn dimîrin. Lê belê eger ku hûn xebatên bedenê bî Ruh bukujin, hûnê jin bîkin.

(Rom 8, 10 û 13)

Û ez Ruhê xwe dikim hundîrê we, û we di qanûnê xwe de didim meşandin, û hûnê emirên mîn bigrin û tetbiq bîkin.

(Hêzekiêl 36, 27)

Bila hemû kesê ku bang navê Xudan dîkin, dev ji xirabiyê berdînin.

(II. Tîm 2, 19)

"Eger ku em emirên Mesih bigrin." Bî vê yekê tê fehmîkirin ku em Mesih nas dîkin:

(I. Yûhenna 2, 3)

DINÊ JI YÊN KU IMAN BI MESİH ANİNE NEFRET DIKE

İsa Mesih got:

Eger ku dinê ji we nefret bike, bizanin ku beri we ji mîn nefret kîriye. Eger ku hûn daxilê dinê bûna, dinê yê ku daxilê wê ne hez dike. Madem ku, hûn daxilê dinê ninin; encax mîn hûn ji dinê vebijartine. Jî bo vê yekê dinê ji we nefret dike.

(Yûhenna 15, 18-19)

Û hemûyên ku aidi Mesih İsa ne û dîlxwazî jîyanek li gora teqwayê bîajan, dê zilmê bîbin.

(II. Tîm 3, 12)

Wê we ji ibadetxanan bîkin der. Erê, saet tê, herkesê ku we dikujin zan dîkin ku ew ji XWEDÊ re xizmet dîkin. Û Ew wê van tiitan bîkin, jî ber ku wan ne Bav nas kîr û ne ji ez nas kîrim.

(Yûhenna 16, 2-3)

Mêzekin, berko em zarokên XWEDÊ werin bangîkirin, Bav hezkîrinek çawa daye me! Bî rasti

ji wisa ye. Ji ber vê yekê dinê me nas nake, ji ber ku dinê Bav ji nas nake.

(I. Yûhenna 3, 1)

Gerek em zehf tengasi bikiiinin û bikevin Padiatiya XWEDÊ.

(K. şandıyan 14, 22)

isa got: Di dinê de kedera we heye. Lê belê cesûr bibin, mîn dinê mexlûb kîr.

(Yûhenna 16, 33)

XWEDÊ XWAZE YÊN BIIMAN BIPARÊZINE

XWEDÊ dibêje: Tu metirse, ji ber ku ez li tev te me; mêze dor xwe meke, ji ber ku Xudayê te ez im; ez te zexm dikim; erê, ez arikariya te dikim; erê, bî destê rastê yê edaleta xwe ez piita te digirim.

(Îşaya 41, 10)

Wisa ku em cesaret dikin û dibêjin: Xudan bî mîn re arikar e, ez natirsim. Ma insan çî bî mîn bike?

(ibr 13, 6)

Ji ber ku bona ku hemû rêyê te de bî te bigrin, ji bo te emir dide melayketên xwe...Ez di geliya sıya mîrînê de bigerim ji, ez ji yê koti natirsim; ji ber ku tu bî mîn re yî.

(Zebûr 91, 11 û 23, 4)

Dema ku dê û bavê mîn mîn berdidin, XUDAN xema mîn dikeve.

(Zebûr 27, 10)

Eger ji bona navê Mesih heqeret ji we bû, hûn çî dilgei in! Ji ber ku Ruh'ê piroz û Yê XWEDÊ li ser we disekine.

(I. Petrûs 4, 14)

Hemû xemginiya xwe bavêjin li ser Wi, ji ber ku ew we diparêz e.

(I. Petrûs 5, 7)

Ez bî arikariya wi yê ku quwetê dide mîn, dikarim her tîştî bikim. Ê Xudayê mîn bî Mesih isa li gora bîlîndîriya zenginiya xwe, her ihtiyacıya we tîji dîke.

(Fil 4, 13 û 19)

SERKETINA LI HEMBER IBLIS Û GUNEH

Bibin girêdayi yê XWEDÊ; lê belê li hember iblis bisekinin û ew wê ji we bireve.

(Yaqûb 4, 7)

Ji ber vê yekê em bî cesaret nêzikê textê merhametê bibin, ku em bigihên merhametê, û di wextê de arikariya Wi bibinin.

(ibr 4, 16)

Lê belê mina ku Ew bî xwe di nav Ronahiyê de ye, eger em di Ronahiyê de bimeiin, bî hevûdu re pariya me wê hebe û xwina Lawê Wi, isa Mesih wê me ji her gunehi paqij bike.

(I. Yûhenna 1, 7)

Hûn xeyri tecriba insan bî tecribeke dîn nehatin tecribe kîrin; lê belê XWEDÊ sadîq e. Ew ji kîşandîna we zêdetir tecribe nade we. Lê belê berko hûn sebrbîkîn, Ew li tev tecribe rêya xelasîyê ji çêdîke.

(I. Kor 10, 13)

Lê belê ji daxwaza xortaniyê birev, û li tev yê ku bî dilê paqij bang Xudan dikin, li dû rastiyê, imanê, hezkîrinê û silametiya birev e.

(II. Tîm 2, 22)

Bî vi awayî hûn ji xwe ji bo guneh mirî, lê belê bî isa Mesih're ji bo XWEDÊ sax bizanin.

(Rom 6, 11)

Berko ez li hember te guneh nekim, mın Kelama te di dilê xwe de vêiart.

(Zebûr 119, 11)

DUA KIRINA RASTI BI XWEDÊ RE QISE KIRINA RUHANI YE

Te got ku li rûyê mın bigerin; dilê mın ji te re got: "Ez li rû yê te digirim, ya XUDAN!"

(Zebûr 27, 8)

Ey gel, tım û tım bi Wi bawer bıkın; dilê xwe li ber Wi dawiênin. XWEDÊ şunda sitar bûna me ye.

(Zebûr 62, 8)

Ya XUDAN, mın qenc bike , û ezê qenc bibim; Tu mın xelas bike, û ezê xelas bibim; ji ber ku ez pesnê xwe bı te didim.

(Yêremya 17, 14)

Li pey hev dua bıkın; ji bo her tışti şıkır bıkın; ji ber ku bı Mesih isa're, xwestina XWEDÊ ji bo we ev e.

(I. Sel 5, 17-18)

Eger ku li nav we de hikmeta yeki kême, bila ji Xudayê ku bı comerdane dide herkesi û nake serevde bixwaze; û wê jê re bê dayin.

(Yaqûb 1, 5)

isa Mesih got:

Eger ku hûn bı mın re bisekinin û gotinên mın ji di dilê we de biskinin, wê çaxê hûn her çi bixwazın wê ji we re bê dayin.

(Yûhenna 15, 7)

Ez li XUDAN gerim, û Wi bersiv da mın; û ji hemû tirsên mın ez azad kırım.

(Zebûr 34, 4)

Eger ez dilê xwe de iunê bidim fesadiyê, Xudan dengê mın nabihize. Ya XUDAN di oxira navê xwe de gunehê mın ef bike, ji ber ku mezin e.

(Zebûr 66, 18 û 25, 11)

ISA MESIH TÊ-AMADEBÛN MECBÛR E

Ji ber ku Xudan bı xwe bı bang kirinek bilind; li tev dengê serok melayik û bı borîya XWEDÊ ji ezman de tê xwar; û beri yên ku bı Mesih're mırine radibin. Dû re em yên ku jin dıkın, yên ku hatine cih hiitin, bona ku em li tev wan Xudan di hewa de pêiwazi bıkın, bı ewran emê bêne girtin û bêne birin. Bı vi awayi emê tım û tım bı Xudan re bın.

(I. Sel 4, 16-17)

Hûn ji hazir bın. Ji ber ku Lawê insan di saeta ku hûn nizanin de wê bê.

(Lûqa 12, 40)

Birayên delal, li gora ku em ji eva waadan re bûne xwedi, xwe ji her mirdariya ruh û bedenê paqij bıkın; di xofa XWEDÊ de, bı pirozi temam bibin.

(II. Kor 7, 1)

Ey zarokên piçûk, niha bı Mesih're jin bıkın, ku dema Ew bı xwe xuya bibe, cesareta me hebe û di hatina Wi de em li ber Wi li nav iermezariyê de neminin.

(I. Yûhenna 2, 28)

Hûn ji sebir bıkın; dilê xwe zexm bıkın; ji ber ku hatina Xudan nêzik e. Birayên mın, li hember hevûdu mire mir nebêjin, ku hukum li we nebe. Mêze, hakim li deri de disekine.

(Yaqûb 5, 8-9)

BI RUH'Ê XWEDÊ TIJI BÛN

Dema ku ez dengê xwe li we hildidim, iuve vegerin. Mêze, ez Ruh'ê xwe li ser we de dirijinim. Ez ji we re Kelamên xwe bêjim.

(Methelokên Silêman 1, 23)

Lê belê di dilê ki de Ruh'ê Mesih tunebe, ew mirov yê Mesih nine. Jî ber ku hemû kesên ku bî Ruh'ê XWEDÊ tîn idare kîrin, lawê XWEDÊ ne.

(Rom 8, 9 û 14)

Û pê ierabê serxoi nebin; ev bêedebbûn e. Lê belê bî Ruh'ê XWEDÊ tiji bîn; ji hevûdu re zebûr, qeside û murxê Ruhi bixwinin. Li dilê xwe de jî Xudan re melodi û qesidan bixwinin. Jî bo her tiştî tim û tim bî navê Xudanê me, isa Mesih jî XWEDÊ û Bav re şikîr bikin. Di xofa Mesih de girêdayîyê hevûdu bîn.

(Efes 5, 18-21)

Jî ber ku jî bo razibûna xwe, yê ku di jiyana we de him xwaze û him jî iuxul dîke, Xuda ye.

(Fil 2, 13)

Hûn ibadetxana XWEDÊ'ne û Ruh'ê XWEDÊ li nav we de jin dîke, ma hûn vîna nizanin? Jî ber ku hûn bî biha hatin kîrin; jî ber vê yekê XWEDÊ di bedena xwe de bidin bîlîndkîrin.

(I. Kor 3, 16 û 6, 20)

Erê, xwendevanên delal !

Xeyri isa Mesih tu kes nîkare ku me jî mîrîna abadin xelas bike! Jî ber ku Kelam dibêje: **(Xeyri isa) keseki dîn de xelasbûn tune. Jî ber ku bîn ezmên de naveki dîn jî mirovan re nehatiye dayin, ku em bîkarîbîn bî wi xelas bibin.**

(K. şandîyan 4, 12)

Jî ber vê yekê em jî we hemûyan re disa dibêjin û jî we rîca dikin: Dilê xwe jî bo hezkîrîna XWEDÊ vekin û bî hemû dilê xwe bî isa Mesih iman bikin! Jî ber ku ew bî rasti jî we hez dîke û xwaze we hemûyan azad bike. Dilgeiyya rasti û jiyana abadin, tenê isa Mesih dikare bide we!

Xwendevanên delal !

Ger hûn bîxwazî derbareyî isa Mesih û incilê de hê zêde bizanîn, jî kerema xwe jî me re bînvîsin.

Navnişana me ev e:

Gute Botschaft Verlag

Postfach 80

D-35673 Dillen